Newroz Hejmar (77) Rûpel (5) B.Çile 2007z – 2619k

Çima Bênezîr Boto?!

Dîlan Zivingî

Li ev çend salên dawîn , bêtirî her demeke dîtir , Rojhilata navîn hêmenî û hevpîvan nedîtiye , xelkên wê di heyama bivetî û tirsê de li ber xwe didin , yanê Rojhlata navîn bûye devera şer û cengan. Ji ber ku , mafên mirovan li gel rêjîm û sîstemên rojhilat binpê û tune bû ye . Ji doz û pirsgirêka gelê Kurd ve bigire ta ya Felestînî , di Îraq , Libinan û Avxanistan re derbasbe ta bigehe Pakistan , ew bûne cîgehên kul û derdan. Hin destên mezinan hene , berjewendiyên wan ên teng û pir bi kirêt dihêlin bêçare bimînin . Lewre jî, rûdawa nezanî, dijatî , xizanî û kuştinê bêtir li van deverên me li jor bi nav kirine hertim yê gol û hewş vedin . Destên hêzên reş û teror serî hildane û çi li vir û çi li wir bi dehan mirovên xwedî bîrûbawerî, bi kemberên peqok û turmbêlên bombekirî ew têne kuştin . Heyf û pir mixabin ku , ew jina bîrbir , dilêr û jîrek , di -27-ê 12 an sala 2007an de, xanim **Bênezîr Boto**, bi xinzî bi destên terorîzimê dihate kuştin!. Dawîsala 2007an û sersala 2008 an, li ser xwediyên wê û gelê Pakistanê bi êş û jan derbs dibû ! Ma gelo çend jinên mîna Bênezîrê li ba dewletên Rojihlat hene?!. ,Wê bêtirî carekê , bi serbilindî weke serokwezîra

Pakistanê cî girtibû. Bêgûman ew bi xebat û dilsoziya xwe ve , hêvî û vîn di dilê her keç û jinên Rojihlat de geş û bilind dikirin û bi pêdarî û xebata xwe ve nîşan didan . Herçiqas pêwîste jin li maf û rola xwe xwedî derkeve. Ne jî dest girêdayî li rewş û pirsgirêkan weke , li pir waran dixuye ! temaşe bike . Min dil heye , di helwestên mîna vê de , gotina pêşiyên me Kurdan bînim zimên : "Şêr şêr e çi jin çi mêr e". Xanim Bênezîr Boto, keça Zolfeqar Elî Boto ye, sala -1953.an ji dayîk bûye û li Birêtanya xwendina xwe ya bilind , beşê zanista siyasitê kuta kiriye. Piştî wergera desthilatê ya li serê bavê wê weke serokê Pakistanê, wî digrin û bidarve dikin . Xanim Bênezîr bi soz û peyman sund dixwe ku , ewê heyif û tola bavê xwe yê hilde û dê bi rêk û pêk xizimeta gelê Pakisitanê bike . Lê mixabin ew jî dihate kuştin . Bila serê zarok , malbata wê , gelê Pakistanê û hemû berketiyên wê sax bin , bêgûman Bênezîr Boto yê herdem di hiş û ramanê her mirovekî xwedî bîrûbawerî de zindî bimîne. Li dawî hêjayî gotinêye , em ji xwedevanan re diyar bikin , ku Xanima me Bênezîr Boto, ji dapîreke Kurd , ji Kermenşahê ye. Ew dapîr li Necefê bi kalpîrê Bênezîra me re zewcî , paşê çûn Pakistanê. Erê bênezîra me , di nûgihaya xwe de, bi porê çîl û nêrîn û helwestên rastgo ji hevsiyan ve diyar dibû , ku kurdîtiyê tê de reng vedane .